# Bultena heftane

# 21/10/2023

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

**Nûçeyên ji cîhanê**

## Jinan Dusseldorftê tecrîda li ser Abdullah Ocalan nîqaş kirin

NAVENDA NÛÇEYAN - Li bajarê Dusseldorf a Almanyayê di forûma ‘Azadî wê bi ser bikeve’ de tecrîda li ser Rêberê PKK’ê Abdullah Ocalan, pêngava ji bo azadiya wî hatiye destpêkirin, teorî û pratîkên li ser azadiya jinan hatin nîqaşkirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219988

Çavkanî:JINNEWS



## Jinan ji Ewropayê doza azadiya Werîşe Mûradî kir

Jinên li paytextên Swêd û Belçîkayê bi daxwaza azadiya endama KJAR’ê Werîşe Mûradî ya ji aliyê hêzên Îranê ve hatî revandin, çalakî li dar xist.

https://hawarnews.com/kr/jinan-ji-ewropaye-doza-azadiya-werise-muradi-kir

Çavkanî:JANHA



## Li Îzlandayê jin dê ji bo rojekê grevê bikin

Jinên li Îzlandayê ji bo şermezarkirina newekheviya destmiz û şîdeta li ser bingeha zayendî wê sibe grevê bikin. Serokwezîr Katrín Jakobsdóttir jî dê beşdarî grevê bibe.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-Izlandaye-jin-de-ji-bo-rojeke-greve-bikin-41612

Çavkanî:JINHA




## Li Nîjeryayê 7,7 milyon zarokên keç dê li dijî penceşêrê bên derzîkirin

Li Nîjeryayê hat ragihandin ku dê 7,7 mîlyon keç bên derîkirin da ku penceşêra malzarokê pir kêm bibe.

https://jinhaagency.com/ku/tenduristi/li-nijeryaye-7-7-milyon-zaroken-kec-de-li-diji-pencesere-ben-derzikirin-41648

Çavkanî:JINHA



# Xelata "Nûçegihanên Jin a Herî Wêrek a Cîhanê" ji Yalda Meîrî re hat dayîn

Rojnamevan û wênekêş Yalda Meîrî ku di serhildana şoreşgerî ya “Jin Jiyan Azadî” de hatibû girtin, hêjayî xelata “Nûçegihanên Jin a Herî Wêrek a Cîhanê” hat dîtin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/xelata-nucegihanen-jin-a-heri-werek-a-cihane-ji-yalda-meiri-re-hat-dayin-41691

Çavkanî:JINHA



# Rojhilata navîn

## Li Êlihê Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Jinan dest pê kir

Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Jinan ku bi dirûşmeya “Jina Azad, Hunera Azad” li Êlihê tê lidarxistin bi pêşengeh, panel û nîşandana fîlman dest pê kir.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/li-Elihe-mihricana-Cand-u-hunere-ya-jinan-dest-pe-kir-41574

Çavkanî:JINHA




## Xelkê Suweydayê bi biryar in: Em natirsin!

Jinên beşdarî xwepêşandanên li parêzgeha Suweyda ya Sûriyê bûn bi gotina “Ev meydan yên me ne û em ê gotina xwe bêjin. Em natirsin." careke din dan zanîn ku heta daxwazên wan pêk neyên dê têkoşînê bidomînin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/xelke-suweydaye-bi-biryar-in-em-natirsin-41566

Çavkanî:JINHA



## Lêkolînera Mexribê: Divê em bi jinên Filistînî re bibin yek

Lêkolîner Letîfe El-Buhsînî diyar kir ku êrîşên dijmirovî yên Îsraîlê li dijî Filistînê sûcên şer e, bal kişand ser berxwedana jinên Filistînî û banga hevgirtinê li hemû jinan kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/lekolinera-mexribe-dive-em-bi-jinen-filistini-re-bibin-yek-41561

Çavkanî:JINHA



## 'Mamosteyên ku boykotê dikin li benda piştgiriyê ne'

Boykota mamosteyan li bajar û bajarokên Kurdistanê li dijî nedayîna mûçe û bi fermî tayîn nebûnê berdewam dike. Mamoste Nesrîn Ehmed dibêje: "Ev boykota me şoreşek li dijî gendeliyê ye."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/mamosteyen-ku-boykote-dikin-li-benda-pistgiriye-ne-41559

Çavkanî:JINHA



## Jinên Efganî: Julia Parsî û Neda Perwanî serbest berdin

Tevgera Xwepêşandêr a Jinên Xwepêşander daxwaza berdana jinên girtî yên di girtîgehên Talîbanê de kir û got, "Cihê jinên xwepêşander û parêzvanên mafên mirovan ne zindan e."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-efgani-julia-parsi-u-neda-perwani-serbest-berdin-41556

Çavkanî:JINHA



## Armîta Power ya girtî dest bi greva birçîbûnê kir

NAVENDA NÛÇEYAN - Aktîvîst Armîta Power ku bi hinceta tevli çalakiyên 'jin jiyan azadî' bûye hatibû girtin li girtîgeha Tebrîzê dest bi greva birçîbûnê kir.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219990

Çavkanî:JINNEWS



## Aktîvîstên TJA'yê bertek nîşanî destdirêjiya li Îdirê dan

ÎDIR - Aktîvîstên TJA'yê bertek nîşanê destdirêjiya li Îdirê pêk hatî dan û bal kişandin ser polîtîkayên şerê taybet û gotin: " Divê em zarokên xwe biparêzin. Divê saziyên mafê mirovan û saziyên jinan xwedî li zarokan derkevin. Ger ku em bêdeng bin dê ev bûyer zêdetir bibin."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219943

Çavkanî:JINNEWS




## Hilberînerên tûtinê: Em nikarin debara xwe bikin

COLEMÊRG - Menîca Şakar a li gundê Bêgoza yê Şemzînanê hilberîneriya tûtinê dike wiha got: "Em nikarin debara xwe bikin. Ji cihekê hatiniya me tune ye. Em naxwazin çandina tûtinê bê qedexekirin. Qe nebe em pê debara xwe dikin."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219937

Çavkanî:JINNEWS



## ‘Divê desthilatdarî ewil gotinên xwe biguhere’

AMED - Parêzer Huriye Hamidî  diyar kir ku di sûcên îstîsmara li hember zarokan de polîtîka û gotinên desthilatdariyê bi bandorin û got beriya her tiştî divê polîtîkayek ku zarokan diparêze bê avakirin û divê bi guhertina gotinan ev bê destpêkirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219935

Çavkanî.JINNEWS



## ‘Kurdî li hemberî çeka tirkî parastineke herî xurt e’

ŞIRNEX - Hevgerînendeya Weşana Giştî ya Kovara Destarê, Jîn Aryen a ku tevlî komxebata rêveberiyên herêmî ya HEDEP'ê û HDP'ê bû diyar kir yek ji mijara di komxebatê de hat nîqaşkirin ziman û çand e û diyar kir ku rêveberiyên heremî ji bo fermîbûna zimanê kurdî cihekî girîng digire.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219933

Çavkanî:JINNEWS



# Medyaya Îranê: Mirina mejî ya Armîta Geravand pêk hat

Hat ragihandin ku Armîta Gerawend a 16 salî ya ku li Îranê di encama tundiya 'polîsên exlaqî' de ketibû komayê, mirina mejiyê wê hat ragihandin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/medyaya-Irane-mirina-meji-ya-armita-geravand-pek-hat-41598

Çavkanî:JINHA



# Jinên Tûnisî li dijî êrîşên Îsraîlê her roj çalakiyan li dar dixin

Jinên Tûnisî hema bibêje her roj ji bo şermezarkirina êrîşên Îsraîlê yên li ser Şerîda Xezayê çalakiyan li dar dixin. Jinên Tûnisê bal dikşînin ku ji bo bidawîbûna êrîşan divê ji her derê cîhanê jin werin ba hev û di nava piştgiriyê de bin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-tunisi-li-diji-erisen-Israile-her-roj-calakiyan-li-dar-dixin-41595,

Çavkanî:JINHA



## Armita Pavîr a ‘îtîrafkarî’ lê tê ferzkirin di grêva birçîbûnê de ye

Hat ragihandin ku xwendekara bi navê Armîta Pavîr a ku li Îranê 3 car hat girtin, ji bo bibe ‘îtîrafkar’ bi ferzkirinên hêzên Îranê re rû bi rû dimîne û xwendekar li dijî vê dest bi greva birçîbûnê kiriye.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/armita-pavir-a-itirafkari-le-te-ferzkirin-di-greva-bircibune-de-ye-41594

Çavkanî:JINHA



## Li Îranê li du rojnamevanan cezayê girtîgehê hat birîn

Li du rojnamevanên ku nûçeyên destpêkê yên der barê qetilkirin û merasîma cenazeyê Jîna Emînî de çêkirin, cezayê girtîgehê hat birîn.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-Irane-li-du-rojnamevanan-cezaye-girtigehe-hat-birin-41593

Çavkanî:JINHA



## Li Yemenê ji ber şer hejmara zarokên ku dixebitin zêde dibe

Ji Weqfa Pêşketina Mirovî ya Masarat Arwa El-Sharabî diyar kir ku ji ber şerê li Yemenê hejmara zarokên dixebitin du qat zêde bûye û diyar kir ku rayedarên dewletê berpirsyariyên xwe yên ji bo zarokan pêk naynin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-yemene-ji-ber-ser-hejmara-zaroken-ku-dixebitin-zede-dibe-41589

Çavkanî:JINHA




## Aktîvîstên Lubnanî: Divê civaka navdewletî ji xewa kûr şiyar bibe

Jinên aktîvîstên mafên mirovan ên Lubnanî diyar kirin ku Îsraîl bi hedefgirtina sivîl û jîngehê li Şerîda Xezayê sûcê qirkirinê pêk aniye û gotin: “Divê civaka navneteweyî ji xewa kûr şiyar bibe û zextê li kiryaran bike ku bên darizandin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/aktivisten-lubnani-dive-civaka-navdewleti-ji-xewa-kur-siyar-bibe-41587

Çavkanî:JINHA



# [Rewşa tendirustiya Nesrîn Javadî a girtî ber bi xirabûnê ve diçe](https://jinhaagency.com/ku/rojane/rewsa-tendirustiya-nesrin-javadi-a-girti-ber-bi-xirabune-ve-dice-41584)

Sendîkaya Kedkarên Azad ên Îranê ragihand ku rewşa tendirustiya çalakvana kedkar Nesrîn Javadî ya 66 salî, ya li girtîgeha Êvînê girtî ye, ji ber nexweşiyên wê yên kronîk û nebûna dermankirinê û şert û mercên girtîgehê roj bi roj xirabtir dibe.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/rewsa-tendirustiya-nesrin-javadi-a-girti-ber-bi-xirabune-ve-dice-41584

Çavkanî:JINHA



# [Jinên Kurd li dijî polîtîkayên şerê taybet bi hunerê li ber xwe didin](https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/jinen-kurd-li-diji-politikayen-sere-taybet-bi-hunere-li-ber-xwe-didin-41583)

Welatiyên Êlihê ji bo Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Jinan a ku li Êlihê di roja xwe ya 2'emîn de berdewam dike, dan û diyar kirin ku ev mihrîcan wê li dijî polîtîkayên şerê taybet bidome û divê çand û ziman li her derê mijara esasî be.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/jinen-kurd-li-diji-politikayen-sere-taybet-bi-hunere-li-ber-xwe-didin-41583

Çavkanî:JINHA



# [Aisha Hamouda: Divê em dengê jinên Filistînî bigihîjînin hemû cîhanê](https://jinhaagency.com/ku/rojane/aisha-hamouda-dive-em-denge-jinen-filistini-bigihijinin-hemu-cihane-41582)

Seroka Komîteya Jinan a Herêma Ereb Aisha Hamouda banga hevgirtina bi gelê Filistînê re kir û got: "Divê em li dijî êrîşên Îsraîlê dengê jinên Filistînî li hemû cîhanê bidin bihîstin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/aisha-hamouda-dive-em-denge-jinen-filistini-bigihijinin-hemu-cihane-41582

Çavkanî:JINHA



# [Cemre Işik: Mirina jinan a bi guman tune ye!](https://jinhaagency.com/ku/rojane/cemre-isik-mirina-jinan-a-bi-guman-tune-ye-41580)

Di salên dawî de her ku diçe mirina bi guman a jinan wekî 'xwekuştin' zêde dibe. Parêzer Asya Cemre Işik jî diyar kir ku mirina bi guman a jinan rêbazeke ku mêr ji bo xwe rewa nîşan bide ye.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/cemre-isik-mirina-jinan-a-bi-guman-tune-ye-41580

Çavkanî:JINHA



## Ji HEDEP'ê ji bo avakirina Wezareta Jinê pêşnûmeqanûn

Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (HEDEP) ji bo avakirina Wezareta Jinê pêşnûme qanûn da Meclîsê.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-hedep-e-ji-bo-avakirina-wezareta-jine-pesnumeqanun-41616

Çavkanî:JINHA




## 'Jin di nava dîwarên pergala baviksalarî de girtî ne'

Li gundewarê Dîvandereyê jin û zarokên keç hema bêje ji hemû mafê xwe yê xwezayî bêpar tên hiştin. Fateme Derxor a li gundê Zaqe mamosteya yekê ye tiştê ku jin dijîn anî ziman.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jin-di-nava-diwaren-pergala-baviksalari-de-girti-ne-41610

Çavkanî:JINHA



# Rojnamegera Filistînî: Bajarê Xezayê veguherî goreke komî

Rojnamegera Filistînî Marah Atallah a bal kişand ku li Xezayê ji ber êrîşên Îsraîlê qetlîamek çêbû, anî ziman ku bajar bi rastî veguherî goreke komî û tîmên berevaniya sivîl nikarin kesên ji ber êrîşan di bin xirbeyan de mane rizgar bikin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/rojnamegera-filistini-bajare-xezaye-veguheri-goreke-komi-41605

Çavkanî:JINHA



# 'Yekane rêya bidestxistina xakê têkoşîn û berxwedan e'

Aktîvîsta femînîst a Tûnisî Raja Dahmanî banga ducarkirina hewldanên ji bo piştgirîkirina doza Filistînê kir û destnîşan kir ku yekane rêya vegerandina erdên hatine dizîn têkoşîn û berxwedan e.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/yekane-reya-bidestxistina-xake-tekosin-u-berxwedan-e-41603

Çavkanî:JINHA



## [‘Şerê desthilatdaran zererê dide jin û zarokan’](https://jinhaagency.com/ku/rojane/Sere-desthilatdaran-zerere-dide-jin-u-zarokan-41602)

Jinên sendîkayan diyar kirin ku herî zêde jin û zarok ji şerên li Rojhilata Navîn bi bandor dibin û ji bo sivîl zirarê nebînin, banga hawîrdoreke aram kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/Sere-desthilatdaran-zerere-dide-jin-u-zarokan-41602

Çavkanî:JINHA



## [Lîstika “Erus-î Baran” li Serdeştê hat ecibandin](https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/listika-erus-i-baran-li-serdeste-hat-ecibandin-41629)

Lîstika “Erus-î Baran” ya ku derhêneriya wê Maede Darlekî dike, li Rojhilat çû ser dîkê û eleqeyek mezin girt. Şano peyamê dide jinan ku divê tu carî serî li ber zextên civakê netewînin.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/listika-erus-i-baran-li-serdeste-hat-ecibandin-41629

Çavkanî:JINHA



## Wêneyên xwe li peyariyên Tehranê nîşan dide

Fatima K. xwendekara beşa wêneyê ye li Tehranê, wêneyên xwe yên ku çêkirine ji bo firotinê li ser peyariyê pêşkêş dike û nêrîna civakê ya li jinan rexne dike.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/weneyen-xwe-li-peyariyen-tehrane-nisan-dide-41628

Çavkanî:JINHA



## Li Esfehanê serdegirtina malan: 10 jinên Belûcî hatin girtin

Li Esfehanê di serdegirtina malan a ji aliyê hêzên ewlehiyê ve 10 jinên Belûcî hatin girtin. Nayê zanîn ku ka jinên hatine girtin birine kuderê.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-esfehane-serdegirtina-malan-10-jinen-beluci-hatin-girtin-41625

Çavkanî:JINHA



## Terora siyasî li Başûr di çarçoveya şerê taybet de didome’

Dewleta Tirk bi riya siyaseta sîxurkirina jinan û qetilkirina azadixwazan dixwaze desthilatdariya xwe li ser Başûrê Kurdistanê bisepîne. Çalakvan Şîlan Şakir got ku ev siyaseta şerê psîkolojîk ê taybet e.

https://jinhaagency.com/ku/siyaset/terora-siyasi-li-basur-di-carcoveya-sere-taybet-de-didome-41622

Çavkanî:JINHA



## Jinên Êlihê: Em ê ji bo çand û zimanê xwe têbikoşin

Jinên beşdarî Mîhrîcana Jinê ya Çand û Hunerê ya ku li Êlihê hat lidarxistin bûn, diyar kirin ku ew ê têkoşîna çand û zimanê xwe bidomînin û peyam dan ku ew ê rê nedin polîtîkayên şerê taybet.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/jinen-Elihe-em-e-ji-bo-cand-u-zimane-xwe-tebikosin-41621

Çavkanî:JINHA



# [Çalakvana Mexribî: Parastina Filistînê erkeke mirovî ye](https://jinhaagency.com/ku/rojane/Calakvana-mexribi-parastina-filistine-erkeke-mirovi-ye-41619)

Ji Weqfa Amantî ya Qudisê Shaîma Jarandî diyar kir ku Şerîda Xezayê veguheriye goristanê, sûcên şer tên kirin lê saziyên navneteweyî bi bêdengî li rewşê temaşe dikin û got: “Parastina Filistînê erkeke mirovî ye, divê helwest were nîşandan.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/Calakvana-mexribi-parastina-filistine-erkeke-mirovi-ye-41619

Çavkanî:JINHA




# [Li Mêrsîne jinek hat qetilkirin](https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220065)

MÊRSÎN - Jina bi navê Ayfer Kaya ku li navçeya Mûtê dijiya, tevî biryara dûrxistinê jî ji hêla Şuayîp Kaya ve hate qetilkirin ku di qonaxa hevberdanê de bûn.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220065

Çavkanî:JINNEWS



## Franziska Stier: Hêviya me ji desthilatdariya zilmê dike tune ye!

ENQERE - Sekreter Giştî ya Basta Fransîzka Stîer diyar kir ku gelek dewlet bi Israîlê re di piştevaniyê de ne û hinek jî bi Fîlîstînê re û got: “Lê em dinêrin ku kes bhsa şerê li Rojava tê meşandin nake. Ger ku em ji desthilatdariya zilmê dike bi hêvî bin dê çareserî pêk neyê.”

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220051

Çavkanî:JINNEWS



## Gelek bac ji xwediyên projeyên biçûk tê standin

Beşdarên festîvalên werzî ku kesên xwediyên projeyên biçûk yên xwemalî ne, ji wan gelek cûrên bac û kirêyeke zêde tê wergirtin. Jinên tevlî festîvalê bûne diyar dikin ku ji ber bacên zêde ew qezenca madî ji berhemên xwe nakin, lê ji bo nasandina berhemên wan ev festîval başin.

https://rojnews.news/ku/?p=284387

Çavkanî:ROJNEWS



## Di kesayeta jinê de dagirkerî

Bi derketina her alozî û şerekî ku ji encama hişmendiya zilamsalarî derdikeve, di destpêkê de jin dibin hedef û qurbaniyên yekem û dawî. Li aliyek jî rûbirûyê revandin, destdirêjî û êşkenceyê dibin. Piştî şer jî yên herî zererê ji encama kavilkariya ku desthilata zilamsalarî derketiye dibînin, dîsa jinin.

https://rojnews.news/ku/?p=284208

Çavkanî:ROJNEWS



## Di pêşangeha 'Jin Jiyan Azadî' de têkoşîna jinên Kurd hat nîşandan

Di pêşangeha 'Jin Jiyan Azadî' ya li Varşova ya paytaxta Polonyayê hat destpêkirin de têkoşîn û keda jinên Kurd tê nîşandan.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/di-pesangeha-jin-jiyan-azadi-de-tekosina-jinan-kurd-hat-nisandan-41642

Çavkanî:JINHA



## Jinên Yemenê dixwazin di siyaset û pêvajoyên muzakereyê de cih bigrin

Tevî qebûlkirina biryara 1325'an a Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî ya li Yemenê, jin ji siyaset, pêvajoyên aştî û muzakereyê tên dûrxistin.

https://jinhaagency.com/ku/siyaset/jinen-yemene-dixwazin-di-siyaset-u-pevajoyen-muzakereye-de-cih-bigrin-41647

Çavkanî:JINHA



## 'Divê ji bo jinên Filistînî yekitiya jinan a kurevî bê avakirin'

Aktîvîsta mafên mirovan a Filistînî Hana Mughamîs bal kişand ser sûcên şer ên Îsraîlê yên li dijî Şerîda Xezayê û diyar kir ku pêwîstiya yekitiya jinan a kurevî heye ku bi jinên di şeran de herî zêde zirarê dibînin re bibin yek.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-ji-bo-jinen-filistini-yekitiya-jinan-a-kurevi-be-avakirin-41650

Çavkanî:JINHA



## Jinên Rojhilat: Bi dirûşma 'Jin Jiyan Azadî' em hişyar bûn

Jinan dirûşma 'Jin Jiyan Azadî' ku bû dirûşma serhildana piştî qetilkirina Jîna Emînî dest pê kir ji bo xwe weke hişyarî bi nav dikin û dan zanîn ku bi wê dirûşmê wan dest bi fikirandina jiyana azad kirine.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-rojhilat-bi-dirusma-jin-jiyan-azadi-em-hisyar-bun-41651

Çavkanî:JINHA



## Ji bo 6 welatiyên Behayî yên Tehranê cezayê girtîgehê

Li Tehranê, Saeeda Khazoui, Saba Sefidi, Samira Ebrahîmî, Iraj Shakur, Pedram Abhar û Arslan Yazdanî yên ji baweriya Behayî bi giştî zêdetirî 30 sal cezayê girtîgehê hat dayîn.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-bo-6-welatiyen-behayi-yen-tehrane-cezaye-girtigehe-41654

Çavkanî:JINHA



## SAMER: Polîtikayên qayûmê bandorek neyînî li ser têkoşîna li dijî tundiyê kir

SAMER der barê ‘Rolê jinên li saziyên Amedê di têkoşîna li dijî tundiya li hemberî jinan’ de lêkolînên li qadê de bal kişand ser bandora neyînî ya polîtîkayên qayûm ku di têkoşîna li dijî tundiya li hemberî jinan de dimeşîne.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/samer-politikayen-qayume-bandorek-neyini-li-ser-tekosina-li-diji-tundiye-kir-41657

Çavkanî:JINHA





## ‘Li dijî pirsgirêkan rêxistinbûna xwendekaran girîng e’

ÎZMÎR - Bi krîza aborî re pirsgirêkên starbûnê ya xwendekaran jî didome. Xwendekara zanîngehê Fadîme Ozdemîr, diyar kir ku xwendekaran neçarî yurdên tarîkat-cemaetan dikin û li dijî vê rêxistinbûna xwendekaran girîng e.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220160

Çavkanî:JINNEWS



# Li Îdirê jinan bertek nîşanî tiryak û fûhûşê dan

ÎDIR - Bi pêşngiya TJA'yê li Îdirê li dijî tiryakê û bûyera zaroka ku bi tecawizê re rû bi rû mabû daxuyanî hat dayîn. Di daxuyaniyê de, hat gotin ku zarok di hedefa desthilatdaran de ne û li dijî fûhûş û tiryakê banga mezinkirina têkoşînê hat kirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220192

Çavkanî:JINNEWS




# Li Afganîstanê di mehekê de 7 jin û 4 zarokên keç hatin qetilkirin

Li Afganîstana di bin desthilatdariya Talîbanê de jî mafê jiyanê ji destê jinan tê girtin. Di mehekê de 7 jin û 4 zarokên keç hatin qetilkirin, mirina bi guman a 7 jinan jî weke 'întîxar' hat qeydkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-afganistane-di-meheke-de-7-jin-u-4-zaroken-kec-hatin-qetilkirin-41679

Çavkanî:JINHA



## [Bi 'Projeya Însaaf' hewl didin xwe bigihînin hemû jinan](https://jinhaagency.com/ku/rojane/bi-projeya-Insaaf-hewl-didin-xwe-bigihinin-hemu-jinan-41675)

Armanca 'Projeya Însaaf' a li Bîngazî hatiye destpêkirin diyarkirina rola jinan di derxistina biryarê di siyaseta zagon û wekhevîyê da girêdayî ye.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/bi-projeya-Insaaf-hewl-didin-xwe-bigihinin-hemu-jinan-41675

Çavkanî:JINHA




## [Ji pevçûnên Îsrail û Hamasê herî zêde jin û zarok bandor dibin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-pevcunen-Israil-u-hamase-heri-zede-jin-u-zarok-bandor-dibin-41672)

Ji ber şerê ku ew 19 roj in li Filistînê di navbera Îsraîl û Hamasê de didome rewş her diçe xirabtir dibe. Di êrişên tên pêkanîn de, herî zêde jin û zarok zirar dibînin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-pevcunen-Israil-u-hamase-heri-zede-jin-u-zarok-bandor-dibin-41672

Çavkanî:JINHA



## [Jinên ku zanîngeh temamkirine neçar dimînin ku karên cûda bikin](https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/jinen-ku-zaningeh-temamkirine-necar-diminin-ku-karen-cuda-bikin-41669)

Jinên ciwan ên ku zanîngeh û peymangeh temam kirin û heta niha bi awayek fermî tayîn nebûne, di werzên komkirina berhemên çandiniyê de li baxçeyan kar dikin û dahata jiyana xwe dabîn dikin.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/jinen-ku-zaningeh-temamkirine-necar-diminin-ku-karen-cuda-bikin-41669

Çavkanî:JINHA



## [Komeleya Jinan a Rosa têkoşîna jinan di xebatan de derdixe pêş](https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220223)

AMED - Komeleya Jinan a Rosa ya 5 sal in li Amedê û derveyê wê bi jinan re di nava piştevaniyê de ye, bi rêveberiya xwe ya nû têkoşîna xwe didomîne. Endama Lijneya Rêveberiya Komeleyê Ezgî Sila Demîr, diyar kir ku wek komeleya di bin sîwane, rêgez  û şertên xwe de xebatên xwe dimeşînin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220223

Çavkanî:JINNEWS



# Îsraîlê li Xezayê 3 hezar zarok û hezar û 700 jinan qetil kir

Nûnerê Daîmî yê Neteweyên Yekbûyî (NY) yê Filistînê Riyad Mansûr got ku di êrîşên Îsraîlê yên li ser Xezayê de heta niha 3 hezar zarok û hezar û 700 jin hatin qetilkirin. Li hemû deverên Xezayê mirin û wêranî heye, li tu cihê wê ewlehî nemaye.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/Israile-li-xezaye-3-hezar-zarok-u-hezar-u-700-jinan-qetil-kir-41688

Çavkanî:JINHA



# 'Kampanya li dijî êrîşa li ser jinê û xwezayê bersiv e'

ÊLIH - Endama Meclîsa Şaredariya Heskîfê Zozan Şîmşek da zanîn ku li dijî êrîşên desthilatdariyê ji bo keda jinê bidin xuyakirin û bêjin êdî bes e kampanya dane destpêkirin û got ku  bi vê kampanyayê bersivê didin van êrîşan.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/220284

Çavkanî:JINNEWS



# Rêwşa jinan Li Efganistan û Iraqê

Rêxistina Jin, Aştî û Ewlekariyê (WAPS), anketek navneteweyî der barê statûya jinan di nava civakê de çêkiriye, derketiye ku rewşa jinên Efganistanê û Iraqê rêzên herê dawî de ye.

https://hawarnews.com/kr/rewsa-jinan-li-efganistan-u-iraqe

Çavkanî:ANHA




# Jinên Tevgera Azadî: Li ku derê zilm lê hebe wê dengê azadiyê bilindtir bibe

Desteya Jinan ya Tevgera Azadî diyar kir ku dîroka sîstema mêtînger nekariye hêza xwe heta hetayê bidomîne, li ku derê zilm lê hebe wê dengê azadiyê bilind bibe.

https://rojnews.news/ku/?p=285163

Çavkanî:ROJNEWS



# Dewleta Tirk, ji jinan re dijminê hare

Rewşa jinan li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê di encama desthilatdariya Erdoxan û Bahçelî de her diçe girantir dibe. Jinek ciwan ji ber ku kesê destdirêjî lê kiriye kuştiye û xwe parastiye 24 sal cezayê girtîgehê jêre tê xwestin. Li aliyê din jinek din bi çeka dewletê hate kuştin, ya din alîkarî ji saziya alîkariya dewletê xwest, ji ber ku neçûn jiyana xwe ji dest da.

https://rojnews.news/ku/?p=285050

Çavkanî:ROJNEWS



Nûçeyên herêmî

## Li Idliba dagirkirî jinên koçber di şert û mercên zehmet de dijîn

Jinên ku li kampên Idliba di bin dagirkeriyê de di nava şert û mercên zehmet ên jiyanê de dijîn, bi rêbazên kevnar konên xwe temîr dikin, pêwîstiyên xwe yên sotemeniyê dabîn dikin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-idliba-dagirkiri-jinen-kocber-di-sert-u-mercen-zehmet-de-dijin-41564

Çavkanî:JINHA



## Li Serêkaniyê ya dagirkirî jinek hat qetilkirin

Li Serêkaniyê ya ji aliyê dewleta Tirk û komên çete yên girêdayî wî ve hat dagirkirin zext û êrişên li ser jinan zêdetir dibin. Li gundê Ezîziyê ya Serêkaniye Zeyneb Xelef El-Hemadî ji aliyê birayê xwe ve hat qetilkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-serekaniye-ya-dagirkiri-jinek-hat-qetilkirin-41551

Çavkanî:JINHA



## 21'ê Cotmeha 2015'an: Li Til Temirê tabûra jinê hat avakirin

Li Bajarê Til Temirê yê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di çarçoveya xebatên Hêzên Parastina Civakî (HPC) de tabûra jinê hat îlankirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/219931

Çavkanî:JINNEWS



## Jin tevî zehmetiyan xwedîkirina sewalan didomînin

Besma Hemadî ya ku ev nêzî 20 sal in li Cizîrê sewalan xwedî dike diyar kir ku ji ber polîtîkayên şer ên dewleta Tirk xwedîkirina sewalan kêm bûye û got ku ew ê di her şert û mercî de jî karê xwe bikin.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/jin-tevi-zehmetiyan-xwedikirina-sewalan-didominin-41601

Çavkanî:JINHA



# Bi nêzîkbûna zivistanê re fikara koçberên Idlibê zêde dibe

Di dema ku nakokiyên di navbera hikûmeta Şamê û komên çete yên girêdayî dewleta Tirk de gelek malbatên ji Idlibê koçber dibin, bi nêzîkbûna demsala zivistanê re fikarên malbatên ku li kampan jiyana dijwar dijîn zêde dibe.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/xweseriya-Sengale-de-bi-azadiya-reber-apo-misoger-bibe-41620

Çavkanî:JINHA



# Çîroka Sebha ya Ermenî: Piştî salan jî qirkirin berdewam dike

Sebha Nasir Ebas a bavê wê ji komkujiya Ermeniyan rizgar bû, diyar kir ku polîtîkayên qirkirinê bi salan jî dewam dikin û got, "Em bimirin jî em ê li ser axa xwe bimînin û mala me bi ser me de hilweşe jî em ê dev jê bernedin."

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/Ciroka-sebha-ya-ermeni-pisti-salan-ji-qirkirin-berdewam-dike-41618

Çavkanî:JINHA



# Jineke pispora çêkirina blokan

Cemîle Mihemed bi hevserê xwe re blokan çêdike û debara malbata xwe pê dike. Kesên di ber kargeha wê re derbas dibin di serî de hinekî diheyirin lê dûre silavekê didinê.

https://hawarnews.com/kr/jineke-pispora-cekirina-blokan

Çavkanî:ANHA



# Yek mekan du çîrok: Meleba Reş

Meleba Reş ya ku di dema dagirkeriya DAIŞ’ê de li Reqa wek zindan û cihê îşkencê dihat bi karanîn îro bi rola xwe ya esasî ve ji nu ve tê înşakirin û buye cihê perwerdeya verzişî ya jin û ciwanan.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/yek-mekan-du-cirok-meleba-res-41684

Çavkanî:JINHA



Kongra Star

28.10.2023